

ZANYARÎYA JI BO NEXWEŞÎ

Koma Levetiracetam Actavis-ê Terkîba devkî Oral solution

Ji bo dermankirina atîyê

! Zanyarîya girîng!

Eger tu van bibînî serî li dixtorî bixe:

- eger gihîştina zarokê te hêdî dibe an jî gihana wî bi awayekî neasa bi pêş ve biçê
- ta, hingî diçin ciddîtir dibin (w.n. jimara wan zêde dibe)

Levetiracetam Actavis terkîba devkî ye ku tê de methyl parahydroxybenzoate (E218) û propyl parahydroxybenzoate (E216)ya ku kare bibe reaksiyonên alergîk (muhtemelen biderengîketî) hebin.

Levetiracetam Actavis terkîba devkî ye ku tê de maltitol heye. Eger ku dixtor ji te re/zarokê te re got hûn nikarin şekerên xuyandî telafî bikin, berêya standina vî dermanî bi dixtorê xwe re têkilî bike.

Ji bo zanyarîya bêtir, li reçeteya zanyarîya ji bo nexweşî ya di pakêtê de binihêre.

Terkîba devkî Levetiracetam Actavis divê çawa were bikaranîn

Her car terkîba devkî Levetiracetam Actavis-ê bi awayî dixtorê we gotiye bistîne. Eger tu teqez nizanibî, divê tu şîreta dixtorê xwe an karkerê dermanxaneyê xwe bistînî. Dermankirin di rewşa normal de bi doza kêmtir dest pê dibe û derece bi derece bêtir dibe. Dibe ku ew heta têgihîştina doza herî baş a ji bo we dewam bike.

Terkîb kare di nava qedeheka avê an jî biberonekê de were avîkirin.

Divê çawa were bikaranîn


Levetiracetam Actavis ji bo dermankirina demdirêj tê bikaranîn. Tu/zarokê te divê heta ku dixtor ji we re bêje dermankirinê dewam bike.

Heta ku tu şîreta dixtorî nestînî dermankirinê ranewestîne, eger na, dibe bibe sebebê bêtirbûna çendîn felcan. Eger dixtorê te biryara rawestandina dermankirinê da, tu ê te'îmatên derece bi derece rawestandina dermankirina terkîba devkî ya Levetiracetam Actavis-ê jê bistînî.



Eger ez/zarokê min em terkîba devkî ya Levetiracetam Actavis-ê zêde bistîndivê ez çi bikim?

Bandorên kêlekî yê standina doza zêde ya terkîba devkî Levetiracetam Actavis-ê; xewokibûn, tûre bûn, êrîşkarî, şiyarîya kêmkirî, astengîya di standina bihnê de û koma ye. Eger tu/zarokê te bêtirî terkîba ji aliyê dixtor ve hatiye xuyandin bistîne bi dixtor re têkilî bike. Dê dixtor dermankirina herî baş a ji bo standina doza zêde bide xuyandin.





ZANYARÎYA JI BO NEXWEŞÎ

Koma Levetiracetam Actavis-ê Terkîba devkî Oral solution

Ji bo dermankirina atîyê

Eger ez/zarokê min standina derman ji bîr bike divê em çi bikin?

Eger te di ser dozêkê an çend dozan de qebaz dabe bi dixtorê xwe/yê zarokê xwe re têkilî bike. Ji bo telafîkirina dozê du dozan nestîne.



Gelo ez/zarokê min karin dermanên din bistînin?

Bandora terkîba devkî Levetiracetam Actavis-ê kare biguhere û standina te/zarokê te ya di yek zemanî de bikaranîna hin dermanên din dibe ku xetera bandora kêlekî bêtir kiribe. Eger tu/zarokê te çi dermanên din distînin an we di nêz de standibe, her car ji dixtorê xwe re bêje. Di nava wan de dermanên bêreçete jî hene.

Bandorên kêlekî yên gelek tîn dîtin çi ne?

Wek dermanên din, ev derman jî dibe bibe sebebê bandorên kêlekî, lê her kesek mûheqqeq jê janê nakişîne. Bandorên kêlekî yên "gelek dîtin" û ji 10 nexweşan bi 1î re dîtî tevî weşîna çermî, êşa serî, gêjbûn, xewokîbûn an tevîzîn, kêmketina ji tevgerê an xumambûna dîtinê ye. Ev bandorên kêlekî gelekê caran karin bi awayê car bi car bêtir kirina derman werin astengkirin.

Li ser bandorên kêlekî zanyariya bêtir kare di reçeteya haydarkirina nexweşî ya di pakêta de were dîtin.



